# Bultena heftane

# 26/4/2024

Email: **starmalper13@gmail.com**

Facebook:kongra star-مؤتمر ستار

Youtube: kongra.star22@gmail.com

**Nûçeyên ji cîhanê**

## [Çalakiyên li zanîngehên DYE’yê her diçe zêde dibin](https://jinhaagency.com/ku/rojane/Calakiyen-li-zaningehen-dye-ye-her-dice-zede-dibin-45183)

DYE, ji ber piştgiriya xwe ji Îsraîlê re di van rojan de bûye cihê çalakiyên herî mezin. Çalakiyên ku li Zanîngeha Columbiayê li dijî Îsraîl û Bîden dest pê kirin li dehan zanîngehan belav bûn.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/Calakiyen-li-zaningehen-dye-ye-her-dice-zede-dibin-45183

Çavkanî:JINHA



## [Belgefîlma Hêza di Festîvala Fîlmên Kurd de Xelata Jîna Emînî wergirt](https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/belgefilma-heza-xelata-jina-emini-wergirt-45230)

Festîvala Fîlmên Kurd a Dusseldorfê ya 1'emîn ku li bajarê Dusseldorf ê Elmanyayê hate lidarxistin bi merasîma xelatdayinê bi dawî bû. Belgefîlma Hêza ya bi derhêneriya Derya Denîz 'Xelata Jîna Emînî' wergirt.

https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/belgefilma-heza-xelata-jina-emini-wergirt-45230

Çavkanî:JINHA



## YJK-S’ê 8’emîn kongreya xwe li dar xist

**Di 8’emîn Kongreya Yekîtiya Jinên Kurd a Swîsreyê (YJK-S) ku li ser esasê rêxistinbûna serdema nû li Baselê hate lidarxistin de peyama, "Em ê projeya Rêbertiyê ya nîvcomayî bi şoreşa jinê temam bikin” hat dayîn.**

https://anfkurdi.com/jin/s-182817

Çavkanî:ANF



## Dê jin li Stûttgartê ji bo Abdullah Ocalan bimeşin

NAVENDA NÛÇEYAN - Li Stûttgartê ya ku girêdayî eyaleta Wurttemberg Baden a Başûrê Elmanyayê, bi pêşengiya tevgera jinên ciwan TêkoJIN’ê wê ji bo azadiya Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan meş were lidarxistin.

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/232857

Çavkanî:JINNEWS



## Xwepêşandanên li zanîngehên DYE’yê didomin

Li zanîngeha Columbia ya li DYE’yê xwendekarên ku ji bo piştgirya Filistîn çalakiyan berdewam dikin, avahiya zanîngehê dagir kirin. Polîs ketin kampusê û êrişî xwendekaran kirin. Hat zanîn ku gelek xwendekar hatine binçavkirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/xwepesandanen-li-zaningehen-dye-ye-didomin-polis-ketin-kampusan-45293

Çavkanî:JINHA



## ‘Tundiya li dijî jinan qeyranek neteweyî ye’

Serokwezîrê Awûstralyayê Anthony Albanese, piştî xwepêşandanên ku li gelek bajarên mezin hatin lidarxistin, diyar kir ku tundiya li dijî jinê ‘qeyrake neteweyî ye’ û wiha got: “Divê ji bo ji holê rakirina tundiyê em hemû berpirsiyariya xwe bi cih bînin.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/tundiya-li-diji-jinan-qeyranek-neteweyi-ye-45298

Çavkanî:JINHA



## Piştî têkoşîna 150 salan, gelo jinên kedkar karîne mafên xwe bidest bixin?

Nêzîkî du sedsale karkerên cîhanê ji bo bidestxistina mafên xwe bênavber di nava têkoşînê de ne. Lê tevî van hemû salan heta niha jinên kekdar ji ber zayenda xwe rûbirûyê cudakariyê û bêdadiyê dibin û mafên wan tên binpêkirin.

https://rojnews.news/ku/?p=319683

Çavkanî:ROJNEWS



## Serokwezîrê Awûstralyayê: Tundiya li dijî jinan krîzeke neteweyî ye

Serokwezîrê Awûstralyayê Anthony Albanese piştî xwepêşandanên ku li gelek bajarên mezin hatin lidarxistin, ragihand ku tundiya li dijî jinê 'bela' û 'krîzeke neteweyî y

https://anfkurdi.com/jin/serokwezire-awustralyaye-tundiya-li-diji-jinan-krizeke-neteweyi-ye-182920

Çavkanî:ANF



## Esnaf li dijî krîzê têdikoşin: Ji dahatê zêdetir lêçûnên me hene

AMED - Krîza aborî ku bandor li her qada jiyanê û li her alî kiriye, her diçe giran dibe. Jinan der barê krîzê de nêrînên xwe anîn ziman û gotin: "Ji ber krîzê em nikarin xeyalên xwe pêk bînin. Em nikarin tu aktîvîteyek civakî bikin. Ji dahatê zêdetir lêçûnên me hene."

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/232717?page=1

Çavkanî:JINNEWS



## Hevşaredara Pasûrê: Em ê ji nû ve deng û rengê jinan serwer bikin

Li navçeya Pasûra ku saziyên jin û ciwanan ji aliyê qeyûm ve dewrî qeymeqamtiyê hatine kirin, karê serekê yê hevşarederên DEM Partiyê yên tevî veguhestina hilbijêran jî hilbijartinên şaredariyê qezenc kirin ew e ku ji nû ve saziyên jinan vekin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/hevsaredara-pasure-em-e-ji-nu-ve-deng-u-renge-jinan-serwer-bikin-45181

Çavkanî:JINHA



## [Li Şarqiayê jinên karker neçar dimînin dahata xwe bidin hevjîn an jî bavên xwe](https://jinhaagency.com/ku/civak-jiyan/li-Sarqiaye-jinen-karker-necar-diminin-dahata-xwe-bidin-hevjin-an-ji-baven-xwe-45182)

Jinên li gundên bajarê Şarqia yê Misirê dijîn, weke jinên li bajarên din ji mafên bingehîn ên kirîna erd û mîras, bêpar tên hiştin. Ji jinên ku bi saetan li malê û cihên kar dixebitin, dixwazin ku pereyê xwe bidin hevjîn an jî bavê xwe.

https://jinhaagency.com/ku/civak-jiyan/li-Sarqiaye-jinen-karker-necar-diminin-dahata-xwe-bidin-hevjin-an-ji-baven-xwe-45182

Çavkanî:JINHA



## [Siyasetmedar Huda Mansûrî: Divê jinên Tûnisê têkoşîna xwe bikin yek](https://jinhaagency.com/ku/rojane/siyasetmedar-huda-mansuri-dive-jinen-tunise-tekosina-xwe-bikin-yek-45184)

Jinên Tûnisê armanc dikin têkoşîna wan a mafan ku li her qadê dimeşînin bê dîtin. Siyasetmedar Huda Mansûrî, da zanîn ku divê jinên herêmê têkoşîna xwe bikin yek.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/siyasetmedar-huda-mansuri-dive-jinen-tunise-tekosina-xwe-bikin-yek-45184

Çavkanî:JINHA



## ‘Serdana Erdogan ji bo destdirêjiya li ser xaka Kurdistanê ye’

Mamoste û çalakvan Raz Qadir derbarê serdana Erdogan û dialiqandina ala Tirk li Hewlêrê nirxand û got:” Serdana Erdogan û daliqandina ala dewleta tirk li Hewlêrê ji bo berdewamiya êrîş û destdirêjiya li ser xaka Kurdistanê ye.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/serdana-erdogan-ji-bo-destdirejiya-li-ser-xaka-kurdistane-ye-45185

Çavkanî:JINHA



## Om Fahad a Iraqî di êrişa bi çek de hat qetilkirin

Om Fahad a Iraqê, li Bexdayê di encama êrişek çekdarî de hat qetilkirin. Hat ragihandin ku der barê bûyerê de lêpirsîn berdewam dike.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/om-fahad-a-iraqi-di-erisa-bi-cek-de-hat-qetilkirin-45211

Çavkanî:JINHA



## 'Jinên karker li cihê kar bê parastin dimînin'

Çalakvan û parêzvana mafê karkeran Ala Kemal derbarê zext û binpêkirinên mafên karkerên jin axivî û diyarkir ku herî zêde jin li cihê kar rastî binpêkirina mafan tên.

https://jinhaagency.com/ku/civak-jiyan/parezvana-mafe-karkeran-jinen-karker-li-cihe-kar-be-parastin-diminin-45216

Çavkanî:JINHA



## Li Navenda Paşveşandinê ya Ayvacik îdiaya îşkence û destdirêjiyê

Di rapora têkildarî binpêkirinên mafan ên li Navenda Paşveşandinê ya Ayvacikê de îdiayên îşkence û destdirêjiyê jî cih girtin. Di raporê de hate xwestin ku navend ji lêkolînan re were vekirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-navenda-pasvesandine-ya-ayvacik-ideaya-iskence-u-destdirejiye-45222

Çavkanî:JINHA




# [Jinek penaber bi îşkenceyê hat binçavkirin](https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinek-penaber-bi-iskenceye-hat-bincavkirin-45224)

Polîs li rawestgeha metroyê ya Mecîdiyekoy a Stenbolê bi îşkenceyê jineke penaber binçavkirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinek-penaber-bi-iskenceye-hat-bincavkirin-45224

Çavkanî:JINHA



# [Jinên Tûnisê li dijî bêkariyê projeyên çandiniyê pêş dixin](https://jinhaagency.com/ku/ked-u-abori/jinen-tunise-li-diji-bekariye-projeyen-candiniye-pesdixin-45233)

Jinên Tûnisê yên li dijî qeyrana aborî û bêkariyê projeyên çandiniyê pêşdixin û çavkaniyê jiyanê ava dikin, ji jinên din re bûn îlham.

https://jinhaagency.com/ku/ked-u-abori/jinen-tunise-li-diji-bekariye-projeyen-candiniye-pesdixin-45233

Çavkanî:JINHA



## Li Tehranê ajokarên jin ên taksiyê rastî cihêkariyê tên

Nadîa Şokofa ya 10 sal in li Tehranê ajokariya taksiyê dike, da zanîn ew ji aliyê ajokarên mêr ve rastî gotinên zayendîperest, tacîz, heqaret û gefan tên.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-tehrane-ajokaren-jin-en-taksiye-rasti-cihekariye-ten-45236

Çavkanî:JINHA



## Tê xwestin stargeha jinan ya 25 salan were girtin

Fateme Babaxanî ragihand ku li Rojhilat malên stargeh ên jinan ku ev 25 sal e xebat dide meşandin bi hincetên malî tê xwestin were girtin, diyar kir ku mafê jinan li ber çavan nagrin û got: “Ez li dijî her cûrê êrişên derhiqûqê me.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/te-xwestin-stargeha-jinan-ya-25-salan-were-girtin-45242

Çavkanî:JINHA




## Kuştina jinê bi gotina 'xwekuştinê' tê nixumandin

Parlamentera Wanê ya DEM Partiyê Gulcan Kaçmaz Sayyîgît anî ziman ku kuştina jinê bêyî ku bi rengekî berfireh bê lêkolîn weke 'xwekuştinê' tê qeydkirin û ev yek jî cihê gumanan e.

https://anfkurdi.com/jin/kustina-jine-bi-gotina-xwekustine-te-nixumandin-182820

Çavkanî:ANF




## Dê bi dirûşma 'Jin jiyan azadî' li qadan bin

MÊRDÎN - Ji bo mîtînga herêmî ya li Êlihê bangewaziya tevlîbûnê hat kirin. Ji Platforma Jinan a Şahmaranê Gulnîgar Laçîn Karataş diyar kir ku dê bi dirûşma "Jin jiyan azadî" berê xwe bidin Êlihê.

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/232824

Çavkanî:JINNEWS



## Berxwedana jinan a di hafizeyan de mayî

NAVENDA NÛÇEYAN - Jinên ku di 1'ê Gulana 1977'an de li Taksîmê jiyana xwe ji dest dan, bi bîranînên xwe di dilê jinên îro têkoşîna xwe didomînin de dijîn. Bîranînên wan ên kurt weke sembolên têkoşîneke demdirêj di bîra mirovan de ne.

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/232834

Çavkanî:JINNEWS



## Komîteya Jineolojî ya Mexmûrê xebatên perwerdê didomîne

Komîteya Jineolojî ya Wargeha Penaberan a Şehîd Rustem Cudî (Mexmûr) ji bo zanista Jineolojî û girêdayî giştî xebatên pergalê, perwerdeyên xwe bi awayekî periyodîk bi rêve dibe.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/komiteya-jineoloji-ya-mexmure-xebaten-perwerde-didomine-45256

Çavkanî:JINHA



## Li Semsûrê ji bo zarok û jinan Navenda Piştevaniyê hate vekirin

Li gundê Turuş ê Semsûrê ku di erdhejên 6'ê Sibatê de bi rûxandineke mezin re ê rû bi rû ma, Navenda Piştgiriya Zarok û Jinan hat vekirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-semsure-ji-bo-zarok-u-jinan-navenda-pistevaniye-hate-vekirin-45251

Çavkanî:JINHA



## 'Jinên Amazîghê li dijî hişmendiya civakê têdikoşîn'

Seroka Komeleya Jin û Zarokan a Soussê Khadija Ghazalî, diyar kir ku tevî hemû zehmetiyan jî jinên Amazîghê dest bi pozîsyonên biryargirtinê kir û got: "Divê jinên Amazîghê ji bo bigihêjin armancên xwe têbikoşin û xwedî li xeyalên xwe derbikevin.",

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-amazighe-li-diji-hismendiya-civake-tedikosin-45261

Çavkanî:JINHA



## ‘Divê jin li dijî hemû êrişan rêbazên xweparastinê pêş bixin’

Endama desteye Rêveberiya Tevgera Azadiya Komelgeya Kurdistan Ronak Mecîd diyar kir ku divê jinên Rojhilata Navîn û cîhanê li dijî şer, destdirêjî rêbazên xweparastinê bi pêş bixin û bikaribin di hemû qadên jiyanê de cih bigrin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/dive-jin-li-diji-hemu-erisan-rebazen-xweparastine-pes-bixin-45262

Çavkanî:JINHA



## 'Naxwazin rastiya li pişt mirina Dîna derkeve holê'

Doza der barê qetilkirina xwendekara zanîngehê Dîna ya Gabonî hat vekirin, hat taloqkirin. Femînnîstan ji bo Dina bal kişandin ku naxwazin rastiya li pişt mirina Dîna derkeve holê û gotin: “Em tu carî destûrê nadin bêcezatiyê.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/feministan-got-naxwazin-rastiya-li-pist-mirina-dina-derkeve-hole-45265

Çavkanî:JINHA



## Nîka Şakaramî ya hat qetilkirin rastî êrişa zayendî hatiye

Hate zanîn ku Nîka Şakaramî di dema protestoyên Îranê de hatî binçavkirin, piştî 9 rojan cenazeyê wê hate dîtîn rastî êrişa zayendî hatiye.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/derket-hole-nika-Sakarami-ya-hati-qetilkirin-rasti-erisa-zayendi-hatiye-45279

Çavkanî:JINHA



## Sara Reza: Bêyî jinan serkeftina şoreşan ne mîsogere

Endama Desteya Hevserokatiya Tevgera Azadî ya Civaka Kurdistanê (Tevgera Azadî) Sara Reza da zanîn ku Rêber Apo dibêje 'Şoreşek ku jin pêşengiyê neke ne şoreşe û serkeftinê mîsoger nake'. Ji bo vê jî nha têkoşîna Kurdan bi pêşengiya jinan ber bi pêç diçe."

https://rojnews.news/ku/?p=319466

Çavkanî:ROJNEWS



## 'Jin di navenda dîrokê de ne'

AMED- Nivîskar Fatma îzol ku dema girtî bû li ser dîroka jina Kurd lêkolîn kir,di pirtûka xwe ya nû 'ji Xwedavendiyê ber bi Xwedabûnê kurd' de  diyar dike ku jin di navenda dîrokê de cih digire û nirxandinên xwe pêşkêşî xwendevanan dike.

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/232887

Çavkanî:JINNEWS




## Ji ber piştgirî da mafên jinan 11 sal cezayê girtîgehê lê hat birîn

NAVENDA NÛÇEYAN - Li Erebistana Suudî der barê parêzvana mafên jinan Manahel al-Otaibî de ji ber di hesabê xwe yê medyaya dîjîtal de der barê mafên jinan de parvekirin kiriye hatibû girtin 11 sal cezayê girtîgehê hat birîn.

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/232931

Çavkanî:JINNEWS



## Li taxa Koperatîfê rêveberiya jinê

AMED - Keyaya taxa Koperatîfan ya girêdayê navçeya Yenîşehîrê, Fatima Kantar, diyar kir ku ji bo çareserkirina pirsgirêkên taxê û bi taybet jî pirsgirêkên jinan bûye keya.

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/232959

Çavkanî:JINNEWS



## Ji Makbûle Ozer peyam: Ez ê li ber xwe bidim

WAN - Girtiya nexweş Makbule Ozer ku bi malbata xwe re bi rêya telefonê axivî, peyama “Ez ê li berxwe bidim” daye. Keça wê Lorîn Ozer Yetîş jî destnîşan kir ku dema mijar kurd be pergala edaletê hildiweşe û bang Wezîrê Dadê kir ku girtiyên nexweş berdin.

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/232962

Çavkanî:JINNEWS



## ['Li dijî kedxwariyê dê têkoşîna jinan bidome'](https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/232969)

ÎZMÎR - Jinên ku ji bo pîrozbahiya 1'ê Gulanê li Qada Gundogdu ya Îzmîrê kombûn diyar kirin ku herî zêde jin ji newekheviyê bi bandor dibin û gotin: "Jin dê her tim li qadan li ber xwe bidin û ji bo azadiyê têbikoşin."

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/232969

Çavkanî:JINNEWS




## [Ji qada 1'ê Gulanê: Îktidar tenê mirinê ji jinan re daxwaz dike](https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/232973)

WAN - Jinên ku tevlî pîrozbahiya 1'ê Gulanê bûn diyar kirin ku AKP ji bilî mirinê tiştekî nade jinan, lê jin jî dê her têkoşîna xwe ya azadiyê bidomînin.

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/232973

Çavkanî:JINNEWS



## Derbarê Leyla Zana de ceza hat xwestin

ENQERE - Di doza derbarê Leyla Zana hatiye vekirin de bi îdiaya “endamtiya rêxistinê” ceza hat xwestin.

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/232997

Çavkanî:JINNEWS




## Li dijî destdirêj û tundiya li ser jinan kampanya

NAVENDA NÛÇEYAN - Koma Edeleta Aborî ya Tora Erebî ya Civaka Sivîl a Femînîst bi boneya Roja Karkeran a Cîhanê bi  daxuyaniyekê kampanyayek da destpêkirin.

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/233007

Çavkanî:JINNEWS



## Jinên Kedkar ên Mexmûrê: 1’ê Gulanê roja têkoşînê ye

Jinên kedkar ên Wargeha Penaberan a Şehîd Rustem Cûdî (Mexmûr) 1’ê Gulanê ango Roja Karkerên a Cîhanê li tevahî jinên karker pîroz kirin û diyar kirin ku 1’ê Gulanê roja têkoşînê ye.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-kedkar-en-mexmure-1-e-gulane-roja-tekosine-ye-45284

Çavkanî:JINHA




## Li bajarê turîzmê Tyredê jinên karsaz îlhamê didin

Sê jinên Lubnanî kafeya ku li bajarê turîzmê yê Tyredê vekiribûn, rûxmê hemû zehmetiyan karê xwe dimeşînin. Jinan anî ziman ku gelek caran rastî gotinên "Tu jin î, tu çawa karibî" hatine û gotin, "Divê jin ji bo xeyalên xwe têbikoşin."

https://jinhaagency.com/ku/ked-u-abori/li-bajare-turizme-tyrede-jinen-karsaz-ilhame-didin-45286

Çavkanî:JINHA



## [Jinên karker ên li dijî kapîtalîzmê têdikoşin dê li qadan bêjin ‘Jin Jiyan Azadî’](https://jinhaagency.com/ku/lista-roje/jinen-karker-en-li-diji-kapitalizme-tedikosin-de-li-qadan-bejin-jin-jiyan-azadi-45287)

Karkerên ku li dijî kapîtalîzmê têkoşînê didomînin, ji bo azadiya hemû cîhanê li qadan in. Di vê sala ku dirûşma “Jin jiyan azadî” li her derê bilind dibe de dê jin bi dengekî bilind daxwazên xwe bînin ziman.

https://jinhaagency.com/ku/lista-roje/jinen-karker-en-li-diji-kapitalizme-tedikosin-de-li-qadan-bejin-jin-jiyan-azadi-45287

Çavkanî:JINHA




## [‘Mafên jinên karker tê binpêkirin’](https://jinhaagency.com/ku/ked-u-abori/mafen-jinen-karker-te-binpekirin-45289)

Endama Sendîkaya Karkeran ya Silêmanî û serperiştiyara beşa jinan Leyla Kerîm Hemedan diyarkir ku jin di her qadek ji bo pêşxistina aboriya welat, xwedî rola sereke ne û anî ziman ku jin di qada kar de astengiyan dikşînin û mafên wan tê binpêkirin.

https://jinhaagency.com/ku/ked-u-abori/mafen-jinen-karker-te-binpekirin-45289

Çavkanî:JINHA



## [Jinên Sîdî Bouzîdî nikarin xwe bigihînin xizmetên tendirustiyê](https://jinhaagency.com/ku/tenduristi/jinen-sidi-bouzidi-nikarin-xwe-bigihinin-xizmeten-tendirustiye-45291)

Jinên bajarê Sîdî Bouzîdî yê girêdayî Tûnisê diyar kirin ku ji ber nikarin xwe bigihîjînin xizmetên tendirustiyê, dermankirina wan nîvco dimîne.

https://jinhaagency.com/ku/tenduristi/jinen-sidi-bouzidi-nikarin-xwe-bigihinin-xizmeten-tendirustiye-45291

Çavkanî:JINHA



## [Qeyûmê Mala Jinê ya Kardelenê xesp kir petekan jî jê kiriye](https://jinhaagency.com/ku/rojane/qeyume-mala-jine-ya-kardelene-xesp-kir-petekan-ji-je-kiriye-45315)

Mala Jinê ya Kardelenê ya girêdayî Şaredariya Rezanê piştî hilbijartinê ji aliyê qeyûmê ve hatiye xespkirin û ji kursiyan heta sarincê hemû tiişt hatine desteserkirin. 6 yekîneyên jinan ên girêdayî şaredariyê jî bi heman awayî hatin texrîbkirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/qeyume-mala-jine-ya-kardelene-xesp-kir-petekan-ji-je-kiriye-45315

Çavkanî:JINHA



# [Derbarê jinên beşdarî Meşa Şevê ya Femînîst bûn de biryara beraetê](https://jinhaagency.com/ku/rojane/der-bare-jinen-besdari-mesa-Seve-ya-feminist-bun-de-biryara-beraete-45326)

Derbarê 33 jê jin bi giştî 35 kesan de bi sedema tevli Meşa Şevê ya Femînîst bûne doz hatibû vekirin û di dozê de biryara beraetê hat dayîn.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/der-bare-jinen-besdari-mesa-Seve-ya-feminist-bun-de-biryara-beraete-45326

Çavkanî:JINHA



# ‘Divê jin hêza xwe nîşanî civakê bidin’

Jinên Herêma Pişder ya girêdayî Îdareya Raperîn diyarkirin ku divê jin bawerî bi hêz û îradeya xwe bînin, kar bikin û hêza nîşanî civakê bidin.

https://rojnews.news/ku/?p=319614

Çavkanî:ROJNEWS



## Çapemeniya Azad li dijî zilmê bi berxwedanê 3'ê Gulanê pêşwazî dike

Seroka Komaleya Rojnamevanên Jin ên Mezopotamyayê Roza Metîna diyar kir ku ew 3'ê Gulanê ya Roja Azadiya Çapemeniyê ya Cîhanê bi têkoşîna xwe ya li dijî zilmê pêşwazî dikin û got: "Ev êrîş ne tesaduf in. Li dijî têkoşîna heqîqetê êrîşek pergalî heye."

https://jinhaagency.com/ku/rojane/Capemeniya-azad-li-diji-zilme-bi-berxwedane-3-e-gulane-peswazi-dike-45340

Çavkanî:JINHA



## Li Lubnanê hilbijartinên şaredariyan cara seyemîn hatin taloqkirin

Jinên ku bertek nîşanî taloqkirina hilbijartinên şaredariyan ên li Lubnanê dan, wiha gotin: "Em taloqkirina hilbijartinên şaredariyê red dikin, ji ber ku ev di asteke mezin de bandorê li ser namzediya jinan û hilbijartinên giştî dike."

https://jinhaagency.com/ku/siyaset/li-lubnane-hilbijartinen-saredariyan-cara-seyemin-hatin-taloqkirin-45341

Çavkanî:JINHA



## Rûyê Neandertal ê li şikeftek Başûrê Kurdistanê hat dîtin ji nû ve hat çêkirin

Mirovên zanyar, rûyê jineke Neandertal a 75 hezar salî ku kiloxa wê bi awayekî sedan perçe di şikefta Şanederê ya dîroka mirovahiyê ya Kurdistanê ronî dike de hat dîtin, ji nû ve afirand.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/ruye-neandertal-e-li-sikeftek-basure-kurdistane-hat-ditin-ji-nu-ve-hat-cekirin-45353

Çavkanî:JINHA



## Li dijî polîtîkayên şer bi rêxistinbûnê têdikoşin

AMED - Endama Lijneya Rêveberiya RUMUD'ê Zeynep Demîr Akçer derbarê xebatên Komeleya Rengarenk Umutlar û Akademiya Mafê Zarokan a Helîn Hasret Şen de axivî û got: “Em tenê fikr û nêrînên zarokan nadin xuyakirin. Em dixwazin bila zarok xwe wek kesayet xwe hîs bikin.”

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/233018

Çavkanî:JINNEWS



## Ji werzişvanên jin gavên pêbawer ên ber bi serkeftinê

AMED- Tîmên Voleybol û Futbolê yên Jinan ên di bin banê Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê de hatin avakirin, li serketinên li pey hev serkeftinên nû zêde kirin.

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/233041

Çavkanî:JINNEWS




## Qirkirina jinê: 2 jinên din hatin qetilkirin

Li navçeya Sîncan a Enqereyê û li navçeya Kepez a Antalyayê 2 jin hatin qetilkirin, yek jî birîndar bû.

https://anfkurdi.com/jin/qirkirina-jine-2-jinen-din-hatin-qetilkirin-182970

Çavkanî:ANF



## Dr. Pavê Cemîl: Zimanê çapemeniyê du caran jinan dike qurbanê civakê

Dekana Koleja Zanistên Mirovî ya Zanîngeha Silêmaniyê Dr. Pavê Cemîl bi boneya Roja Azadiya Çapemeniyê ya Cîhanê diyar kir ku rewşa jinên rojnamevan ji ber cudakariya zayendî nebaşe, zimanê çapemeniyê jî du caran jinan di civakê de dikin qurbanî.

https://rojnews.news/ku/?p=319983

Çavkanî:ROJNEWS



## Li Rojava têkoşîna jinan ji bo parastina şanoya Kurdî didome

Jinên şanoger ên bajarê Qamişlo ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê destnîşan kirin ku ew ji bo parastina şanoya Kurdî têdikoşin û hêviya wan ew e ku ji bo şanoyê peymangehên pispor bên vekirin.

https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/li-rojava-tekosina-jinan-ji-bo-parastina-sanoya-kurdi-didome-45180

Çavkanî:JINHA



## 'Çapemeniya jinan riya şoreşa hunerî nîşanî min da'

Rêvebera Tevgera Hîlala Zêrîn a navçeya Til Temirê Reşa Elo got ku tişta bûye sedem ji şoreşa jinan bi bandor bibe û dest bi xebatên hunerî bike çapemenî bûye.

https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/Capemeniya-jinan-riya-soresa-huneri-nisani-min-da-45203

Çavkanî:JINHA



## Namzedên jin ên 11 şaredariyên Firatê diyar bûn

Piştî ku pêşhilbijartinên namzedên jin ên hevşaredarên kantona Firatê pêk hatin, lîsteya namzedên ku nûnertiya Kongreya Star dikin diyar bûn.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/namzeden-jin-en-11-saredariyen-firate-diyar-bun-45258

Çavkanî:JINHA




## Li kantona Firatê û Şehbayê pêşhilbijartinên namzetên PYD’ê destpê kir

Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) îro dest bi pêşhilbijartinên diyarkirina namzetên xwe yên hevşaredariyên kantona Firatê û Şehbayê kir.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-kantona-firate-peshilbijartinen-namzeten-pyd-e-destpe-kir-45264

Çavkanî:JINHA



## Li Dirbêsiyê jinek hat qetilkirin

Duh êvarê li navçeya Dirbêsiyê ya girêdayî bajarê Hesekê cenazeyê jinekê hate dîtin. Hate diyar kirin ku jin bi amûrêke birînê hatiye qetilkirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-dirbesiye-cenazeye-jinek-hat-qetilkirin-45269

Çavkanî:JINHA



## Jinên Til Temirê: Bi awayekî demokratîk jin bo namzedên jin deng didin

Jinên navçeya Til Temirê yên ku deng dan namzedên jin gotin ku yekem car e bi awayekî demokratîk jin bo namzedên jin deng didin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-til-temire-ji-bo-diyarkirina-namzeda-xwe-cun-ser-sindoqan-45274

Çavkanî:JINHA



## [Ji jinan komxebata ‘Gavên jinan li ser şopa çeman’](https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/232996)

NAVENDA NÛÇEYAN - Platforma Jin a Ekolojiyê û beşa Jineolojî ya Zanîngeha Rojava komxebata ‘Gavên jinan li ser şopa çeman’ bi dirûşma “Aveke azad jiyaneke azad” li bajarê Qamişloyê li dar xistin.

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/232996

Çavkanî:JINNEWS



## ‘Hilbijartin dê bibe xurtkirina bingehê civaka demokratîk û ekolojîk’

Berdevka Rêxistina Kongra Star hilbijartinên şaredariyê yên li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ku dê 30’yê Gulanê çêbibin nirxand û bang li jinan kir ku berê xwe bidin sindoqan, dengê xwe bi kar bînin da îradeya xwe nîşan bidin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/hilbijartin-de-bibe-xurtkirina-bingehe-civaka-demokratik-u-ekolojik-45314

Çavkanî:JINHA



# Giyanê hevkariyê 6 jin kirin hevkarên kooperatîfekê

6 jin ji gundên navçeya Amûdê kooperatîfeke çandiniyê ava kir, ji bo ku debara xwe xwe bi xwe peyda bikin û aboriya herêmê bi pêş bixin.

https://hawarnews.com/kr/giyane-hevkariye-6-jin-kirin-hevkaren-kooperatifeke

Çavkanî:ANHA



# Li Kobanê qadeke kar a jinan: Nanpêjiya Jiyan

Li Kobanê, Nanpêjiya Jiyan ji bo jinan bûye cihekî girîng ê kar û debarê. Xebatkarên wê hemû jin in. Kedkarên Nanpêjiya Jiyan 1'ê Gulanê Roja Karker û Kedkaran pîroz kirin.

https://anfkurdi.com/jin/li-kobane-qadeke-kar-a-jinan-nanpejiya-jiyan-182910

Çavkanî:ANF



# ‘Ji bo çareserkirina pirsgirêkên ekolojîk dê proje bên pêşxistin’

Berpirsa beşa Jineolojî ya Zanîngeha Rojava Zozan Mihemed a beşdarî komxebata ‘Gavên jinan li ser şopa çeman’ bûbû bal kişand ser qeyranên ekolojîk yên bi pirsgirêka avê re rû dide û got: “Ji bo çareserkirina pirsgirêka avê dê proje bên pêşxistin.”

https://jinhaagency.com/ku/ekoloji/ji-bo-careserkirina-pirsgireken-ekolojik-de-proje-ben-pesxistin-45339

Çavkanî:JINHA



Kongra Star
4/5/2024